**Platforma «Plankirina Randevû Dayînê ji bo serlêdana mafê penaberiya a cara duyem» a Daîra Penaberiyê amade ye.**

Ji îro roja Duşemê 22/8 û pêve platforma «Plankirina Randevû Dayînê ji bo serlêdana mafê penaberiya a cara duyem» ji bo daxwazkarên mafê penaberiyê ku serlêdana wan a ewil bi nîhayî hatiye redkirin têt bikaranîn. Bi taybetî , platform ji bo Hemelatiyên Welatên Sêyem ku ji nuve dixwazin serlêdana parastina navnetewî li welatê me bikin û bi şertê ku serlêdana wan a ewil bi nîhayî hatiye redkirin.

Platform vê gavê bi zimanên: Îngilîzî, Erebî, Bengalî, Farsî, Kurmancî, Darî, Pasto, Albanî, Tirkî, Ûrdû, Gurcî û di pêşerojê da heke pêdivê pê hebe wê zêdetir zimanan xizmetê bide.

Hûn bi rêya vê lînka li jêr dikarin xwe bigihîjinin platformê: https://apps.migration.gov.gr/international-protection-registration

Bi armanca ku bername bi cî were û ji bo xizmeta we bê kirin divê hûn 30 deqqeyî berê randevûya xwe a plankirî werin ciyê tomarkirin/qeydkirinê û divê ewraq û belgeyên ku we didin nasin bi we re bin.

Bi destpêkirina vê platformê êdî sepana skype ku heta vê gavê ji bo wergirtina randevûya tomarkirin/qeydkirinê bû hatiye betlakirin.

A dawîn , em bi bîr tînin ji bo kesên ku dixwazin û heta îro qet serdana Daîra Penaberiyê nekirine û daxwaza parastina mafê penaberiyê nekirine, êdî ev kes ji bo daxawaza mafê penaberiyê dikarin xwe tomar/qeydbikin, li ciyên: Campa Malakasa û Campa Dîavata, li gorî prosedura platforma « Serlêdana Plankirina tomarkirin/qeydkirina a ewil» ya ku hûn bi rêya lînka li jêr dikarin xwe bigihîjinin

(https://apps.migration.gov.gr/international-protection-registration).